


Newroz	Hejmar (79)	Rûpel (3)	Nîsan	2008z – 2620k
Nûçe	û	Çalakî	Nûçe	û Çalakî

***L**i bajaroka **Tirbespiyê**, du şevbuhêrkên çandî ji bal giropa Çanda Kurdî li Tirbespiyê ve hatin lidarxistin. Di hundurê herdu şevan de, du gotar hatin xwendin, yek li ser dîroka Kurd û rola wan di avakirin û afirandina şaristaniyê de bû. Birek rewşenbîr û hezkerên wêje û çanda kurdî lê amade bûn, guftûgo li ser vê rewşê bû. Li ya, din mamoste **Hesen Biro**, fêrdanek li ser rola sazûmanên ne dewletî di berga parastin û berxwedanê de pêşkêş kir.

* **J**i çalakîyên Komîta Dicle ya Fêrkin û Parastina Zimanê Kurdî, lidarxistina hin korsên zimên, pileya alfabê li **Tirbespî , Dêrik , Rimêlan û devera Aliyan**. Di encamê de ezmûn ji wan re hate pêkanîn û yên bi serketî, fêrname wergirtin. Digel xelatkirina şagirtên ku, durvên bilind wergirtibûn. Hêjayî gotinê ye, ku hê jî gelek kors berdewam in.

***B**i helkeftina cejna cîhanî ya jinê, gelek komcivîn li bajarê Dêrik Rimêlan, Tirbespî, Girkê Legê û devera Aliyan hatin lidarxistin. Di wan de, fêrdaneran li ser rewşa pîrekê bi giştî û ya Kurd bi taybetî û rola wê di xebata milletê me yê Kurd li Sûriyê de, rawestiyên û şîrove kirin. Û di wan kocivînan de hin xelat li pîrekên ku bi rolek baş di warê kar, çand û civakê de lîstine hatin belavkirin .

* **Li navça Efrînê.. bazareke nû...Wekî** ku nas e, li her devereke navça Efrînê bazareke hefteyî heye, gelek pêdviyên kesan, malan û karûbarên gundiyan lê tèn danîn. Li roja sêşemê 4ê meha Adarê 2008an, bazareke hefteyî li gundê Be'dîna jî hat damezrandin. Birastî, ew tişteki erênî û sûdar e, şênîyê gundê Be'dîna û hemî gundên derdorê pê şabûn û ew hêvîdarin ku ranewest e û berdewam bibe.



Pîrozbahî

Cejna NEWROZÊ li we pîroz be, bila hemî demên we Buhar û Newroz bin. Hêvîdar in ku li gelê me bibe Buhar, tîrêjên ronahiyê dîwarên reşî û zordestiyê hilweşînin, û ken vegere ser lêvên zarokên bê guneh yên ku bi agirê hovîti û zikreşiyê tene sotin. Gul, kulîlk, sosoin û binefşên welatê me bi serbestî serê xwe hildin, li ber awazên bayê Buharê bi mestî xwe bihejinin..!